Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1277 28-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Ez bi muzîkê dijîm’

Hêvî Keleş/ Qamişlo



**Hunermenda Kurd Laçîn Ibrahîm destnîşan kir ku çanda kurdî ya devkî, beşeke bingehîn e ku bi saya hezkirî, hunermend û stranbêjan derbasî nifşên din dibe û wiha got: “Ez bi muzîkê dijîm.”**

Gelek hunermendên Kurd mîras û çanda gelê Kurd bi stranbêjiyê parastin. Û di parastina çand, huner û nirxê gelê kurd de hunermend, tembûrvan û stranbêjên ciwan ên Kurd rolek mezin lîstin e. Ciwanên kurd ji bo parastina mîrata çandî ya kurdî kedeke mezin dane. Di heman demê de li Rojavayê Kurdistanê bi Hunermendên xwe yên ciwan dewlemend e û bi taybet jin, zarok û ciwan, yek ji wan jî hunermend Laçîn Ibarhîm e.

### Kurtejiyana hunermenda Kurd Laçîn Ibrahîm

Laçîn Ibrahîm di 15’ê Tebaxa sala 2002”an de li gundê Çeqela a navçeya Cindirês hatiye jiyanê. Ew di temenkî biçûk de ji dev dibistanê berdaye û bi muzîkê mijûl bûye. Wê Peymangeha Ariya a Akadimî xwendiye û fêrî lêdana Tembûr û Gîtarê bûye. Berhemek wê bi navê (Dilê min diyarî ji bo te ye) û di 2016”an de wê xelata yekemîm bir di fastîvala hawar de li bajarê Efrînê.
Derbarê jiyan û hunera xwe de Hunermenda Kurd Laçîn Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Ji temenê 6 salî ve dest bi stranbêjiyê kir’

Hunermend Laçîn Ibrahîm anî ziman ku wê ji temenê 6 salî ve dest bi stranbêjiyê kir û wiha got: “Min ji zaroktiya xwe de li dibistanê li gel hevalên xwe herdem distira. Yê ku destek da min û piştgiriya min kir û hişt ku ez bi stranbêjiyê mijûl bibim bavê min bû, wî dît ku ez ji muzîkê hez dikim û jêhatiya min tê de heye. Bavê min hertim moralê min bilind dikir û baweriya wî bi min û dengê min hebû û ji bo wî min ev rê temam kir, bavê min jî tembûrvaneke û ji muzîkê hezdike ji ber wê piştgiriya min kir. Gelek kes ji malbata min bi hunerê mijûl bûne, ji ber wê min jî ji hunerê û muzîkê hezkir.”

### ‘Ji bo min muzîk jiyan û hezkirin e’

Hunermend Laçîn Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand û got: “Mirov dikare bi stranbêjiyê hestên xwe bîne ser ziman û parve bike, herwiha stranbêjî ji bo min cihê rehetiyê ye û aramiyê ye. Stranbêjî ji bo min jiyan û hezkirine, kêfxweşî û zordariyên ku di jiyanê de çêdibin, ez dikarim bi riya muzîkê û stranbêjiyê derxim holê. Daxwez û banga min heye ku li hemû ciwan û nifişên nû yên ku dikevin karê hunerê, ku li ser vê riyê bi awayeke cuda û taybet temam bikin ûbal li ser sitranên filiklorê bikşînin ji ber ku filklor namire her dem em wek nifişên nû pêwîste ku em bi awayekî xweş zindî bihêlin, herwiha bang li hunermendan dikim ku çanda xwe biparêzin û ragihînin nifşên nû.”



# Li Hama mozaîkeke ji serdema Romayê hat dîtin

Navenda Nûçeyan



**Li gundê Meryem yê bajarê Hama ya Sûriyeyê, mozaîkeke ji serdema Romayê hat dîtin.**

Beşa Vekolandinê ya Daîreya Şûnwaran a Hemayê ragihand ku wê mozaîkek li gundê Meryemîn ê Hema yê Sûriyeyê dîtine. Li gorî daîreyê, mozaîk ji serdema Romayê ye û destnîşan kir ku tablo dema kolandina bîrekê di xaniyekî de, di kûrahiya 2.5 metreyan de hatiye dîtin. Pîvanên wê bi qasî 4.30x2 metre ye.

### Ji sê dîmenên sereke pêk tê

Li gorî daxuyaniya mûdîriyetê ku li ser hesabê xwe yê Facebookê parve kiriye, mozaîka ji sê dîmenên sereke pêk tê: Li beşê jorîn resmê Xwedawenda Tyche heye (di mîtolojiya Yewnaniya Kevn de xwedawenda şans, bextê û qederê ye), li kêleka wê bi Yewnanî “Bextewar” hatiye nivisandin, li dora nivîsê jî çarçoveyeke geometrîkî ya heştgoşeyî ya bi şiklê keziyan heye, li derdora wê jî heşt mozîkên çargoşeyî hene. Her wiha li her du kêlekan jî ku motîfên geometrîk ên ji serdema Romayê vedigerin hene.
Gundê Meryemîn ku li newala Humsê li başûrê rojavayê Hemayê ye, yek ji kevintirîn cihên dîrokî yên Sûriyeyê ye. Lêkolînerê fransî René Dussaud destnîşan kir ku li gorî bingehên delîlên kevirî yên li wir hatine dîtin, avakirina wê vedigere sala 2000’î ya berî zayînê.

Bi kamîreya Lîloz Hisên



## FERHENGA BIWÊJAN

**Lingê xwe da ber:**
- Bi heman wateyê.

**Pale qels e hêcet das e:**
- Ji bo nekirinê behane nîşan dan; li paş xist.

**LI SER PÊŞÎGIRTIN Û ASTENGKIRINÊ**

**Berpîk danê:**
- Nexwest were kirin; nehişt were kirin.

**Bi qurmikê zimanê min girt:**
- Gotina min birî; nehişt ez biaxivim.

**Hejan diavêje ber lingê wî:**
- Nahêle karê xwe bike; asteniyan jê re dertîne; karê wî zehmet dike.

**Hejek avêt nava lingên wî:**
- Bi heman wateyê.

**Ling dan berê:**
- Nexwest were kirin; nehişt were kirin.

**Lingê wî jê kir; lingê wî birî:**
- Pêşiya wî girt; nehişt wî karî bike.

**Lingê wî jê birî:**
- Nehişt êdî biçe wir.

**Lingê xwe da ber:**
- Pêşiya wî girt; nehişt bike.

**Palik danê:**
- Nexwest were kirin; nehişt were kirin.

**Rê jê stand:**
- Li pêşiyê bû asteng; nehişt biçe.

**Zimanê wî birî:**
- Nehişt êdî biaxive; pêşiya zimandirêjiya wî girt; tirsand.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Ji 1995’an û heta niha qêrîna bêdeng a Dayikên Şemiyê




Çalakiya Dayikên Şemiyê ku di 27’ê Gulana 1995’an de dest pê kiribûn li seranserî cîhanê bandoreke mezin kir. Dayikên Şemiyê yên ku zarok û mirovên wan ji aliyê dewletê ve hatibûn revandin ji bo ku agahî li ser wan bigrin, her hefte li qada Galatasarayê li hev dicivin. **R-2**

## Derwêşên Serdemê: Alî Haydar Kaytan û Riza Altun



Kongreya PKK’ê ya 12’emîn ku bi banga Rêber Apo kom bû, tê de şehadeta kadroyên pêşeng Alî Haydar Kaytan ku di 3’yê Tîrmeha 2018’an de û Riza Altun ku di 25’ê Îlona 2019’an de şehîd bûne, hat ragihandin.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1277 28-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Qasim Engîn; Bi şehadeta xwe têkoşîna azadiyê tacîdar kir



Endamê Komîteya Navendî ya PKK’ê Qasim Engîn (Îsmaîl Nazlikul) di 27’ê Gulana 2020’an de di êrişeke hewayî ya dagirkeriya Tirk de li Biradostê şehîd bû. Wî 35 salên xizmeta xwe ya di têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê de bi şehadetê tacîdar kir.**R-6**

# DEM DEMA AŞTÎ Û CIVAKA DEMOKRATÎK E

Ji bo pêkanîna aştiyeke mayinde li ser bingeha wekhevî, azadî û demokrasiyê, herwiha pêşîgirtina li şer û aloziyan, di 27’ê Sibata îsal de Rêber Abdullah Ocalan ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ kir. Ev bang li ser asta Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê bi erênî û coşeke mezin hat pêşwazîkirin. Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) jî banga Rêber Abdullah Ocalan bersivand, di navbera 5-7’ê Gulanê de kongreya xwe ya 12’an li dar xist. Lê heta niha rayedarên Tirk ji bo bicihanîna vê bangê, gavên pratîkî neavêtine.**R-4**




## Eyûb Esed; bi hunera xwe çanda folklorî û xurfanî didomîne



Hunermendê xurfanî Eyûb Esed mîna hemû hunermendên Kurd ji zarokatiya xwe ve meraq û hizkiriyê hunerê bû. Hunermend Eyûb diyar kir ku tevî ew ne xwedî berhem e, lê hunera xurfanî kiriye bingeha hunera xwe û got, “Xweseteka min heye ez kilîpekê ji rengê “Xurfanî” ku jê re tê gotin; “fılklorê beriya Mêrdînê” çê bikim, lê derfetên min kêm in.**R-7**

## Îbrahîm Şêxo: Li Efrînê binpêkirin, metirsî û kiryarên dagirkeriyê didomin



Bi rêkeftin û guhartinên ku di asta Sûriyê de pêk hatine, gelê Kurd di Efrînê de hê jî di atmosfera tirs û gefan de jiyan dike. Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo tekez kir ku li Efrînê komên çeteyan binpêkirin û kiryarên dijmirovî berdewam dikin.**R-5**

Keça 3`ê salî bi saxî tê kewandin — Nehîr pale R-2


Desthilata HTŞ’ê zemîna vegera DAIŞ’ê bi hêztir kiriye — Dilyar Cizîrî R-4


“Tirkiyeyeke Demokratîk” — Farûk Sakik R-5

Erdogan li hemberî Kurdan, HTŞ’ê û DAIŞ’ê hildibijêre... — Zekî Bedran R-5


Festîvala Firatê Ya Wêjeyî... çima? — Kemal Necim R-7

# Ji 1995'an û heta niha qêrîna bêdeng a Dayikên Şemiyê

Çalakiya Dayikên Şemiyê ku di 27'ê Gulana 1995'an de dest pê kiribûn li seranserî cîhanê bandoreke mezin kir. Dayikên Şemiyê yên ku zarok û mirovên wan ji aliyê dewletê ve hatibûn revandin ji bo ku agahî li ser wan bigrin, her hefte li qada Galatasarayê li hev dicivin. Çalakî heta roja îro jî bi awayekî girseyî dewam dike.

**Amara Baran/Qamişlo**




### Yekemîn kombuna dayîkên şemiyê

Koma Dayikên Şemiyê ji kesên ku mirovên wan an jî zarokên wan ji aliyê dewlet, cerdewanan û qiruçiyan ve hatine kuştin û revandin pêk tê. Di navbera salên 1980 û 1995'an de li Tirkiyê û Bakûrê Kurdistanê sedan kes hatin revandin û kuştin. heta roja îro jî xwediyê wan hindahiyan tu agahî jiwan nagrin.

Dayikên Şemiyê li dijî windakirinên bi darê zorê û cînayetên siyasî yên li Tirkiyeyê di dema derbeya leşkerî û salên 90'î de, her şemiyê çalakiya rûniştinê ya bêdeng û nobeda komînal li dar dixin. Ji bo balê bikişînin ser rewşa xwe, malbatên windahiyan komeleya bi navê Dayikên Şemiyê avakirin û dest bi çalakiya rûniştinê ya heftane kirin. Dayikên Şemiyê cara ewil di 27ê gulana 1995'an de bi daxwaza "Bila windahî bên dîtin û kiryar bên cezakirin" li meydana Galatasaraya Stembolê li hev kom bûn. Ji vê rojê û vir ve her roja şemiyê bi qurnefîl û wêneyên windahiyan li heman derê kom dibin û xwepêşandanên rûniştinê çê dikin.

Dayikên ku 4 sal in her roja Şemiyê hatin cem hev, di 13'ê Adara 1999'an de ji ber êrîşên polîsan hevdîtinên xwe rawestandin. Di 31ê Çileya 2009an de bi wêneyên windahiyan ji nû ve hatin cem hev û bi xwepêşandanên xwe yên aştiyane berdewam kirin.

### Çalakî bi 4 malbatan dest pê kir

Li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê jî ji darbeya leşkerî ya 12'ê Îlona 1980'yî heta îro mirov tên windakirin. Dayikên Şemiyê ku bi laçikên xwe yên spî, qerenfîlên sor ên di destê wan de û hilgirtina wêneyên windakiriyan tên nasîn û ji bo li aqûbeta windakiriyan bipirsin û kiryar werin darizandin ji 27'ê Gulana 1995'an ve li Meydana Galatasaraya Stenbolê çalakiya Roja Şemiyê li dar dixin. Çalakiyê ewil bi 4 malbatan dest pê kir û di nava du hefteyan de hejmar bû 30 malbat. Di wan demên ewil de polîsan bi dehan car êrîşî çalakiya dayikan kir. Dayikên Şemiyê guh nedan êrîşên polîsan û her hefte derketin Meydana Galatasarayê û li aqûbeta zarok û xizmên xwe pirsîn. Her ku êriş li dijî dayikan dihat kirin û dayik bi israr derdiketin meydanê her wisa hejmara beşdaran a çalakiyê jî zêde dibû. Dayikên Şemiyê ango malbatên windakiriyan bi binçavkirin, êriş, îşkence û mudaxeleyan re rûbirû man. Dayikên Şemiyê ji ber zext û zordestiya dijwar a polîsan neçar man ku di 13'yê adara 1999'an de navberê bidin çalakiya xwe. Piştî bi salan şûn ve Dayikên Şemiyê di 31'ê Çileya 2009'an de li Meydana Galatasarayê kom bûn û ji wê rojê ve bênavber çalakiya xwe didomînin.

25'ê Tebaxa 2018'an di hefteya 700'an de Wezîrê Karê Navxweyî Suleyman Soylû çalakî qedexe kir. Li ser vê, Dayikên Şemiyê çalakiya xwe li kuçeya Komeleya Mafê Mirovan a Şaxa Stenbolê li ber avahiya wê didomînin.

### Li gorî komeleya mafê mirovan

Li gorî komeleya Mafên Mirovan, di navbera 1992 û 1996 de, 792 windakirin û kuştinên bi darê zorê yên dewletê li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê hatine ragihandin. Di wê demê de bi taybetî li ser herêmên kurd rewşa awarte hatibû îlan kirin û ji aliyê cendirme, polês û cerdevanan gelek kiryarên şîdetê, yên keyfî û neqanûnî rû dan. Bi vî rengî ne tenê bi hezaran gund hatin vala kirin, lê gelek kes winda bûn an bûn qurbanê kuştinên nediyar. Piraniya wan hê jî nehatine ragihandin.

### Di çalakiyê de 20 kes hatin binçavkirin

Dayîkên Şemiyê dema ku dixwastin ber bi Qada Galatasarayê ve bimeşin, ji aliyê polîsan ve hatin dorpêçkirin. Dema ku endamên TOP'ê û parlamenterên CHP'ê li cadeya Turnaci Başi hatin ba hev û meşiyan ji aliyê polîsan ve hatin dorpêçkirin. Li vê derê şopandina rojnamegeran hat astengkirin. Piştî wê Dayikên Şemiyê û parêzavanên mafên mirovan, li cadeya Îstîkalalê meş li dar xistin. Dema ku hatin qadê Dayikên Şemiyê di meşa xwe de israr kirin, dorpêç derbas kirin lê belê careke din ji aliyê polîsan ve hatin dorpêçkirin. Piştî dorpêçê di nav de seroka giştî ya ÎHD'ê Eren Keskin, nûnerên partiyên siyasî û parêzvanên mafên mirovan 20 kes bi kelebçeya ji paş ve hatin binçavkirin.

### Polîsan bi gaza bîberê êrîşî dayikan kir

Dayikên Şemiyê 25'ê Tebaxa 2018'an xwestin çalakiyek girseyî li dar bixin. Bêyî ku sedemek were nîşandan girseya li meydana Galatasarayê kom bûn bi qedexeya Wezareta Karên Navxweyî re rûbirû ma. Polîsan êrîşî dayikan kir û 23 kes hat binçav kirin. Polîsan piştî wê yên ku çûn di kafeyan de bi gazên bîberê êrîşî wan kirin û kesên din jî xistin binçavan. Der barê 46 kesan de bi hinceta 'Muxalefeta Qanûna Meş û Xwepêşandanan' hatin tewanbarkirin û doz li wan hat vekirin. Xwişka Hasan Ocak ê ku di sala 1995'an de di bin çavan de hat widakirin, Mesîde Ocak ji rastî êrîşê hat û dayika wê Emîne Ocak a 82 salî jî rastî tundîya polîsan hat. Masîde Ocak der barê hêzên erkdar û amîran de gilî kir. Serdozgeriyê biryara di lêpirsînê de cih nagire da. Piştî wê serlêdana dadgeriya Sulhê ya Ceza ev îtiraz red kir û Masîde Ocak ev doz bir AYM'ê.

### Mafan binpê dikin

Dadgeha bilind îdiaya ku 'nêzîkatiya xirab' red kir hikum kir ku mafê lidarxistina çalakî û meşan binpê dikin hikum kir, enceq li ruxmê biryara AYM'ê dorpêça li qada Galatasarayê nehat rakirin. Lê belê bi zêdegiya dengan biryar hat dayîn ku li gorî madeya 34'an a destûra bingehîn mafê civîn û çalakiyên ku tên lidarxistin mafê wan hatiye binpêkirin. Di serlêdana seroka ÎHD'ê ya Stenbolê Gulseren Yolerî dadgeha bilind de mafê lidarxistin, civîn û çalakiyê tê binpêkirin bi zêdehiya dengan hat hikumkirin. Li dijî biryara dadgehê li ruxmê ku biryara AYM'ê qaymeqamtiya Beyogluyê teblîx kiriye destûr nadin Dayikên Şemiyê çalakiya xwe li dar bixin.

### Strana navdar ji bo windahiyan

Yek ji stranên herî navdar "Beni Bul Anne" ya Ahmet Kaya ye. Ahmet Kaya ku ji ber gotina "Ez ê bi Kurdî bistrêm" hatibû lînçkirin û di 16ê mijdara 2000an de li Fransayê di 43 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dabû, ev stran di sala 1995'an de weşand. Stran behsa windayên di girtîgehê de dike û pir caran bi girêdayên bi Dayikên Şemiyê re tê xwendin.

**Ji Pênûsa Jin**

## Keça 3`ê salî bi saxî tê kewandin

**Nehîr Pale**

Di sedsala 21`emîn de li Sûriyê buyereke ku her kes matmayî kir, qewimî. Gelo em çima balkêş dimîn in? Ji ber em di buyereke wisa de derbas nebûne yan jî me nedîtiye û cara yekemîne ku em dibihîzin. Cinsiyetparêzî bi civaka Minbicê re gihîşte asta herî xeter. Qurbaniya wê ne tenê yek jin e, kuştina jin gelekî asayî bûye û deng jêre nayê kirin. Eger bav keça xwe dixe nava ava kelî û wê dikewîne, sibe wê gelek jin di buyerên wiha re derbas bibin. Dibe ku jin ne tenê bi destê bav were kuştin, hevjîn, bira û kur jî jinê dikujin. Hemû nêzîkatiyên civaka zayendperest di bin navê ol de têne kirin. Jinên li ser zagona eşîreta xwe nemeşin, li gorî wan diyar kiriye tevnegere, cil û bergên wê ne li gorî wan bin, ew ê bi riya rêûresmên eşîretê were ceza kirin. Ji xwe cezakirina mêr a ji jinê re hatiye rewa kirin, ne oldar û ne jî zagon nêz dibin.
Di navbera bav û dayîka keça biçûk a 3`ê salî pirsgirêk derketine û têkiliya xwe bi dawî kirine. Bav dizewicê û ew li gel jina bavê xwe dimîne. Sedema bav keça xwe di ava kelî de dişewitîne û dikuje nediyare, lê belê em girîngî nedin vê yekê. Ji xwe bavê ku keça xwe ya 3 salî dikuje hesab jê nayê xwestin çima wisa kiriye. Eger em bipirsin çima wiha kiriye, wê demê em dixwazin hincetan ji kiryarên wî re bibîn in. Bi kurtasî ew mêrekî cinawir e û ji mirovahiyê dûr ketiye.
Li beramberî vê buyerê dibe ferd û civak li xwe vegerin, em destpê bikin zîhniyet û ruhê xwe analîz bikin, ji xwe bipirsin gelo em çawa dijîn heyanî ku buyerên wisa di civakê de çêdibin. Ev mêrê ku keça xwe ya 3`ê salî bi awayekî hovane kuştiye berhemê zîhniyeta zayendperestiyê ye. Bi vê bûyerê re dawî li kuştina jin nayê û rojane jin têne kuştin. Ev keça biçûk çi guneh kirine ku mîna çaxa navîn saxî di ava kelî de were kewandin. Rêbazekî ku engîzasyonên Dêrê li hemberî jinên zanyar daye bikar anîn li ser vê keça 3`ê salî jî hatiye meşandin.
Rê û rêbazên nêzîkatiyên me yên ji van buyeran re gelo rast in? Em sosret û xemgîn dibin, ditirsin û hewl didin neghîjin rewşa ku ji ber namûs û şerefê werin kuştin an jî bibin qurbana nakokiyên di navbera dayîk û bavên xwe de. Lê belê ev ne çareserî ye û dawî li van buyeran nayê. Tu çiqasî bitirse, bigrî, xwe biparêze mêr dev ji te bernade. Kengî mêr aciz bibe wê hemû kerba xwe di serê dayîk, hevjîn, keç û xwişka xwe de derbixîne. Civaka cinsiyetparêz ev yek asayî kiriye, jin jî behest nêzî dibe, di vê rewşê de zêdetirî xwe bihest nêz dibe, yan tehemul dike yan jî direve û gelek jin jî ji ber vê yekê dawî li jiyana xwe tîn in. Mixabin em çiqasî ji vê heqîqeta heyî birevin wê dîsa li pêşiya me derbikeve.



# Eyûb Esed; bi hunera xwe çanda folklorî û xurfanî didomîne

Hunermendê xurfanî Eyûb Esed mîna hemû hunermendên Kurd ji zarokatiya xwe ve meraq û hizkiriyê hunerê bû. Hunermend Eyûb diyar kir ku tevî ew ne xwedî berhem e, lê hunera xurfanî kiriye bingeha hunera xwe û got, "Xweseteka min heye ez kilîpekê ji rengê "Xurfanî" ku jê re tê gotin; "fılklorê beriya Mêrdînê" çê bikim, lê derfetên min kêm in.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Kurdistana ku bi destê neyaran bûye çar perçe, li her perçeyekê xwe bedewiyeke folkloriya Kurdî nîşan daye û di nava deriya xwe ya huner û hunermendiyê de dewlemend e. Her perçeyek ji Kurdistanê bi hezarên serpêhatiyan ava kirine û domandina roja me ya îro. Hunermendên kurd jî her tim xwe deyndarên welat û vegera Kurdistaneke serbixwe dîtin e, li ser vê bingehê bûne xwedî berhem û qada huneriyê pêş xistin e. Her çiqas gelê Kurdistanê bindestê neyaran bûye, ewqasî vegotinên xwe bi hunerê re pêşkêş kirin e, qedexeya ku li ser jiyana wan û gelê wan hatibû jî, bi hunerê ji cîhanê re vegotin e, ya herî pîroz jî çand û folklora Kurd bi keda wan hate parastin.

### Li ser şopa hev xwedî li hunera gelê xwe derdikevin

Hunermendên Kurd li ser şopa hev xwedî li folklora xwe derdikevin, da ku ew folklora wan mîna gelek folklorên cîhanî bi demê re neyê windakirin. Yek ji wan hunermendan Eyûb Esed e.

### Kurtejiyana hunermend Eyûb Esed

Hunermend Eyûb Esed ku bi bavê Varoj tê naskirin, di sala 1974'an de li gundê Xirbe Sirt ê girêdayî Tilbirak ji dayik bûye. Zarokatiya xwe li gundê Xirbe Sirt qedandiye. Her wiha xwendina xwe ya seretayî jî li dibistana Ismayîl Toqan a taxa Xiwêran a bajarê Hesekê xwendiyê.
Eyûb di sala 2007'an de ji gund derdikeve û berê xwe da bajarê Hesekê û li taxa Salihiyê neştecih dibe. Dema ku şoreşa Rojavayê Kurdistanê di sala 2012'an de tê lidarxistin, ew berê xwe dide bajarê Qamişlo û ji wê demê heya niha li bajarê Qamişlo jiyan dike. Esed mîna her hunermendekî Kurd ji zaroktiya xwe ve meraq û hizkiriyê hunerê dibe û li ser şopa dibistana hunermendên nemir Yûsivê Çelebî û Hiznî Şêxî ku bandora wan pir bû li ser wî hebû, dest bi xebatê hunerî dike, êdî rêya hunermendiya wî ji wir tê destpêkirin. Eyûb di hunera xwe de mewal û xurfanî bingeh digire. Di heman demê de lêdana tembûra xwe jî bi xurfanî lê dide.

### Carnan hezkirin têrê nakê, ji ber astengî dibe kelem e

Eyûb tevî ku xwedî dengekî zêrîne û hezkirina wî ji hunerê re mezin e, lê derftên wî nebûn ku ew bi xwe berheman çê bike, ji ber kar dikir, da ku dabara jiyana xwe û zarokên xwe bike, ji ber ew bavê 2 keç û 2 xortan e. Herwiha li ser xwe zehmet didît û digot; Karê hunerî û karên cûda bi hev re nabin. Lewra diviyabû ku ew rêya kar hilbijêre û xwenên xwe yên huneriyê veşêre. Di heman demê de Eyûb ji ber ku li gund jiyan dikir bi karê çandinî, sewaldarî, koçerî û karên cuda cuda mijûl dibû, ev hemû rê li ber jiyana wî ya hunerî digirt.
Eyûb di 8 saliya xwe de dest bi vegotina stranan kir û di sala 2000'î de dest bi lêdana tenbûrê kir. Lêdana tenbûra xwe jî bi rengê xurfanî lê dide.

### Hunera xuefanî çi ye?!

Xurfanî folklora bi desta ye, tenbûr tenê ye, tu alavên muzîkê yên din pê re tune ne, stranên wê giran in, dîlana wê ya mila ye, her kes jî nikare vê dîlanê bike, bi taybet ji bo nifşên nû ev rengê hunerê pir zehmet e. Her wiha tenbûrên berê yek perçe bûn û xwedî dengekî bilind bûn, ew tenbûr niha kêm bûne, lê tenbûrên niha perçe perçe bi hev tên çêkirin û ne xwedî dengê bilind in. Folklor bi wate ye, lê ne her kes wateya wê nas dike. Hunermend Eyûb Esed derbarê jiyana xwe ya hunerî de ji Rojnameya me re axivî.
Eyûb jiyana berê bi nexweşiyê anî ziman û diyar kir ku çend salin rewş ber bi xweşiyê ve diçe û wiha got: "Jiyana min di destpêkê de bi nexweşî li ser min derbas bû, lê ji salên 2000'î û şûn de êdî rewş ber bi başbûnê ve çû. Her dem jî xwestekên min hebûn ku ez bi xwe berheman çê bikim, lê derfetên min bi min re nebû alîkar".

### 'Folklorê beriya Mêrdînê'

Esed eşkere kir ku xwesteka wî heye kilîpeke bi rengê xurfanî çê bike û wiha got: "Xwesteka min heye ku ez kilîpekê ji rengê "Xurfanî" çê bikim ku jê re tê gotin; "folklorê beriya Mêrdînê"



ku tê de şal û şap, cilên ku çanda kurdan pê diyar dibe, hebe. Her wiha heger hunera xurfanî neyê gotin wê bi demê re ber bi windabûnê ve biçe, niha nifşên ku li dû me derkevin nizanin ku ev stranên xurfanî yên kevin ên kê ne, ji ku hatine û çawa çêbûne, lewra ez hunera xurfanî vedibêjim ku bi nifşan re bidim xuyanîkirin ku folklora vê herêmê yê beriya Mêrdînê heya Şengalê bi vî rengî bû".

### 'Hunera kevin mîrasekî dîrokî ye'

Eyûb Esed diyar kir ku hunera Kurdî ya kevin mîrasekî ku nayê windakirin û wiha got: "Hunera Kurdî ya kevin tu carî winda nabe, bi hezarên salan wê stranên wê werin gotin. Ji ber ku ew ne stranên demikî ne. Lê muzîka nû deng nade, 10 rojan li stranên nû tê guhdarkirin û winda dibe, sedemên wê ew e ku mijar ji stranê re tune ye. Dema di dîrokê de stran tê gotin divê mijara wê hebe. Lê stranên kevin ev sedên salan ji bîr nebûn e, ji ber ku ew xwedî bûyer û mijar in. Her wiha niha jî bi pêşketinên heyî re her 10 rojan straneke nû derdikev û nabe ku di 10 rojan de stran werin çêkirin".

### 'Şoreşa Rojava derfeta jiyaneke nû ya huneriyê bû'

Eyûb Esed axaftina xwe wiha qedand: "Min nû dest bi hunera xwe ya rastîn kiriye, berê min ji xwe re nedikir kar, ji ber her dem mijûlî karên cuda cuda bû. Hem jî rêjeke tarî ya Baas rê li pêşiya me digirt û qedexeya hunera me dikir. Lê Şoreşa Rojava derfeta jiyaneke nû ya huneriyê bû. Hunermendên ku distrên divê ku hindirê wî paqij be û kîn di dilê wan de tune be, ji ber ku her tiştî bi rêya hunerê tînin ser zimanê."



**Têbînî**

## Festîvala Firatê Ya Wêjeyî… çima?



**Kemal Necim**

Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di salên dawî de xebat û karên çandî geş bû ye, her wiha her dem gelek çalakiyên cur bi cur têne lidarxistin. Lê tişta ku tê dîtin ku xelk pir tevlî van çalkiyan nabe. Ji xwe tê zanîn ku yek ji hêmanên sereke yên çalakiyên çandî beşdarbûna gel e, bêyî beşdariyê ti çalakî nagihêje armanca xwe.
Li aliyekî din, weke tê dîtin ku naveroka çalakiyên çandî pir qels e, dubarekirî ye û hêmanên nûjenî û nûkirinê têde tune ne. Ji bo serkeftina her çalakiyeke çandî yan hunerî hin hêmanên sereke hene ku bêyî wan tu çalakî bi serkeftî nayên lidarxistin.
Ya yekem, divê alî û saziyên ku çalakiyê li dar dixin, ango dezgeh û saziyên ku bi kar û barên çandî ve mijûl dibin, kes û desgehên têgihiştî bin, siyaseteke wan a çandî û rewşenbîrî ya diyar hebe, li gorî wê jî plansaziyeke wan a tekûz hebe. Halê hazir desteyên çandê yên li herêmê û berpirsên desteyên çandê, ne kesên pêkhatî ne û pirê caran ti têkiliya wan bi karên çandî tune ye û ne rewşenbîr in.
Duyem, divê mijar û naveroka çalakiyên çandî bi awayekî tekûz were hilbijartin û amadekirin, ango divê armanca çalakiyê diyar be, beşa civakê ya ku çalakî ji bo wan hatiye lidarxistin diyar be. Lê di rewşa heyî de çalakî bê armanceke diyar têne lidarxistin, lewma wê berê xwe bide kîjan beşê civakê jî ne diyar e.
Sêyem, hilbijartina kesên ku dê mijarên çalakiyê û naveroka wê pêşkêş bikin. Hilbijartina mêvanan pêvajoyek girîng e, û divê bi baldarî were kirin da ku çalakî bi ser bikeve û bigihîje armancên wê. Hilbijartina mêvanan ji bo çalakiyên çandî hewce dike li gorî bandor û zanebûna wan be, divê di warê çandê de kesayetên bibandor bin û di mijara çalakiyê de pispor bin da ku cemawereke berfireh kom bike û nirxê çalakiyê baştir bike. Ya çarem jî, pêwîste di ragihandinê de çalakî bi awayekî têr û bi bandor were belavkirin.
Li gorî van têbîniyan, van rojên dawî li bajarê Reqayê çalakiyeke çandî bi navê Festivala Firatê ya Wêjeyî hate lidarxistin. Agahiya pêşî di der barê çalakiyê de roja lidarxistina çalakiyê di ragihandinê de hate belavkirin, ango ev çalakî ji hêla cemawer ve nehatiye bihîstin û nasîn, lewma mirov nikare gazinan bike çima cemawer beşdar nabe.
Li gorî navê çalakiyê ew festîvaleke wêjeyî ye, lê di bernameya festîvalê de gelek çalakiyên din ên ku têkiliya wan bi wêjeyê re tune ye hene. Ev jî diyar dike ku kesên ev çalakî lidarxistine der barê karê xwe de ne zana û pispor in.
Mêvanên çalakiyê ne li gorî pisporî û şarazayiya wan hatine hilbijartin, lê belê li gorî dostanî û nasîbûnên kesane hatine vexwendin. Her wiha armanca sereke ya vê çalakiyê ne zelal e, ka çima hatiye lidarxistin.
Ji ber tê zanîn ku Festîvala Reqa ya Wêjeyî heye wê piştî çend mehan were lidarxistin, lewma lidarxistina vê festîvala niha, weke çalakiyeke bê armanc û tenê ji bo lidarxistina çalakiyekî û derbaskirina demê û kêf û wensê hatiye lidarxistin.

# Qasim Engîn; Bi şehadeta xwe têkoşîna azadiyê tacîdar kir

**Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Qasim Engîn (Îsmaîl Nazlikul) di 27'ê Gulana 2020'an de di êrişeke hewayî ya dagirkeriya Tirk de li Biradostê şehîd bû. Wî 35 salên xizmeta xwe ya di têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê de bi şehadetê tacîdar kir. Wî bi rûmet xebata bênavber, hilberîn û parvekirinê ji derdorê xwe re veguhest.**

**Têkoşîn Amara/Qamişlo**

Fermandar Qasim Engîn , ku di têkoşîna xwe ya zêdetirî 35 salan de bi şev û roj, ji bo ku bibe milîtanekî rastîn ê Rêber Apo xebitî, xwe li gorî paradîgmaya Rêbertiyê perwerde kir û her tim hewil da ku çêtir û xweşiktir bike, jiyana xwe li ser perspektîfa Rêbertiyê ya 'Rastî Tevahî ye' ava kir, bi hişmendiya ku tevlîbûna PKK'ê tê wateya tevlîbûna Rêbertiyê, û ev yek jî tevlîbûna ramanên Rêber Apo ye.

### Qasim Engîn kî ye?

Qasim Engîn di sala 1966`an de li navçeya Mereş pazarcixê ji dayîk dibe di emrekî biçûk de malbat koçê Almanyayê dike û dibistana seretay li wê dixweynê û piştê 15 salan derbasê welat dibe. Di sala 1985'an de tevgera azadiyê nasdike û di sala 1989 'an de li Awrupa tevlî Tevgera Azadiya Kurdîstanê dibe. Li qada Ewropayê xebatên ciwanan, çand û hunerê, dîplomasiyê dimeşîne. Di sala 1990'î de ji bo xwe bi rastiya gelê Kurdistanê re bike yek, û ji bo derbasî qada Rojhilata Navîn ya Rêber Apo lê bû bi israra xwe ser dikeve û li qada Rêbertî perwerde dibîne. Şehîd Qasim li Başûrê Kurdistanê jî li herêmên Behdînan, Bradost û Qendîlê kar dide meşandin.

### Di temanek ciwan de PKK'ê nas dike

Fermandar Kasim di temenek ciwan de PKK'ê nasdike û di sala 1985'an de berpirsiyartî digre ser milê xwe û erkê xwe yên welatparêziyê pêk tîne. di sala 1989 'an de wek şoreşgerek dil wêrek tevlî refên PKK'ê dibe û di qada Evrûpa de xebatên ciwana, çand û hûner û Dîplomasî dide meşandin di nav xebatan de hezkirina xwe di dile herkesekî de çêdike. Fermandar Kasim li ser daxwaz û bi israra xwe derbasê qada Rêber Apo dibe. Di sala 1990'î de daxwaza wî pêk tê derbasê herêma Lûbnanê ku akademiya Mahsûm Korkmaz dibe li wê Rêber Apo ji nêz ve nasdike.

### Fermandar Qasim di roportajek de behsa naskirina xwe bi Rêber Apo re dike

Min di Mijdara 1990'î de bi Rêber Apo re hevdîtin kir. Dema ku em ji Lubnanê çûn Bekayê, min Rêber cara yekem ji nêz ve dît. Civîna yekem bi merasîmekê pêk hat. Ew bi nîqaşên Kongreya 4-an re hevdem bû. Ji ber vê yekê, dema ku ez çûm kampê, Rêber Apo piştî nêzîkî 15 rojan hat. Nêzîkî 400 heval di kampa me de hebûn. Dema ku serok hat, merasîmek mezin hate lidarxistin. Dema rêber gihîşt, di merasîmê de hin kes hebûn ku li ser hişê xwe ve çûn. Min ev yek berê jî bihîstibû, lê gava min bi çavên xwe dît, bi rastî ez matmayî mam. Dema ku wî di merasîmê de destê xwe dirêj kir ji bo silavkirinê, min ji nêz ve dît ka Rêber çiqas bi heybet e û min heyecaneke mezin hîs kir.

### Nirxandinê Rêber Apo gelek bandor limin kir

Min berê di pirtûkan de li ser Rêber û sosyalîzmê xwendibû. Ev tenê hewldanek teorîk bû. Dema ku min di civînekê de di pêvajoya kampê de li nirxandinên Rêbertiyê guhdarî kir, min ji xwe re got, "Bijî Sosyalîzm." Nirxandina wî ya li ser bingeha mirovperweriyê pir bandor li min kir. Dema ku wî bi mînakên ji dîroka me û ezmûnên xwe rave kir, min karî çêtir fam bikim ka çima sosyalîzma rastîn hilweşiya.

### Xebatên çapemeniyê de kedek bê hempa dimeşîne

Tekoşer Kasim Engîn ku ji bo ragihandina Kurd û jiyana entelektuel gelek ked û renca wî hebû. Têkoşîna Azadiyê bi berdêlên mezin dimeşe û şehadeta Kasim Engîn bû delîl û nîşana vê yekê. Keda di ber ragihandina Kurd de dayî, kar û xebatên wî yên li ser dîrokê ku berê gelê Kurd zêdetir da têkoşîna azadiyê û xebatên wî yên ji bo vê têkoşînê, ji aliyê ragihandina Kurd û gelê Kurd ve rêz û hurmeta mezin bû. Xizmeteke mezin ji bo ragihandina Kurd kiriye, ked daye û hewl daye. Fermandar Kasim bi Tempoya xwe ya xebatê de dê ji bo xebatkarên ragihandina Kurd her tim nimûneyek bê hempa bû.

### Tevgera azadiya Kurdistanê bi cîhanê dide naskirin

Fermandar Kasim demek dirêj berpirsiyartiya HPG-BÎM'ê dike . Diwî demê de propagandayê bi bandor yên Gerîllayê azadiya kurdistanê li welat û çarparçeyên cîhanê dike, da ku tevgera azadiya kurdistanê rast bide naskirin. diwirde xebakî serkeftî dide meşandin. her wiha fermandar kasim di xebatê hevgirtina



Malbatê Şehîdan de jî cîh digre û di her şert û mercê de serkeftinê ji bo xwe esas girt. Bi dîsîplîna xebatê û şewaza ku afirand, pêşengitî jî xeta şehîdên PKK'ê re dike.

### Hafîzeya Tevgera Azadiya Kurdistanê bû

Fermandar Qasim, dema ku bi salan li çiyayên Kurdistanê wekî gerîla dixebite , bê guman yek ji wan waran bû ku di nav partiyê de herî zêde lê çalak bû, xebata îdeolojîk li ser bingeha belavkirin, ravekirin û fêmkirina paradîgmaya Rêber Apo û felsefeya Rêber Apo ji hêla tevahiya civakê ve, hatibû organîzekirin. Bi hewildaneke pir mezin bi dijwarî dixebite û berheman diafirand. Di perwerdehiya çapemenî û weşanê, akademî û hemû warên xebatê de roleke sereke dileyize. Hertim girîngî dida aliyê îdeolojîk yên qadroyan.

### Dîrok niha ye

Heval Qasim, lêkolîner û pratîsyenekî baş e, perspektîfa PKKê ya ji nû ve nivîsandina dîroka Kurd û Kurdistanê û afirandina pêşerojek azad û wekhev wekî rêberê xwe girtiye û di nivîsandina dîroka azadîxwaz a Kurd û Kurdistanê bi giştî de beşdarîyên mezin kiriye. Wî xwendinên xwe yên dîrokê di tevahiya jiyana xwe de entegre kir, her kêliyê bi felsefeya dîrokê ya Apoîst re tevn kir, û hewlek bênavber da ku dîroka Kurdistanê bîne hişê xwe û bi awayekî rast şîrove bike. Ji bilî gelek dersên ku wî li ser vê mijarê dane, pirtûka ku wî amade kiriye, 'Dîrok Niha ye - Dirok Nihaye mîrateya herî hêja ye ku wî ji me re hiştiye.
Fermandar Qasim ku girîngiyeke taybet dida xebatên ajîtasyon û propagandayê, bi awayekî sîstematîk hewl da ku felsefeya têkoşînê ya Tevgera Azadiyê bigihîne beşên berfireh ên civakê. Wî girîngiyeke mezin da xebata nivîsandina dîroka partiyê, bîrdozî, wêje, şehîd û jiyana azad a di xeta Rêber Apo de bi tevahî, û beşdarî amadekirina gelek broşur, gotar, nivîsar û lêkolînên ser mijarên cûrbecûr bû.

# 'Şitilgeh cewhera xweşikbûna xwezayê ye'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Azad Elî ku xwediyê şitilgeheke li bajarê Qamişlo ye diyar kir ku ev 5 salin ew karê şitilgehan dike û wiha got: "Min ji ber hezkirina şitilgehan endezyariya çandiniyê xwend, niha jî min li Qamişlo şitilgehek vekir."**

Çandina dar, gul û kulîlikan cewhera bedewiya jîngeh û xwezayê ye. Di salên borî li bajarê Qamişlo gelek şitilgeh hatin vekirin, yek ji van şitilgehan jî li Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo ye. Di vê şitilgehê de gelek cureyên dar, gul û kulîlikan hene.
Derbarê rewşa şitilgehan xwediyî şitilgehê û endizyarê çandiniyê Azad Elî ji rojnameya me re axivî.



### 'Bi çandiniya daran û kulîlikan bajar tê xemlandin'

Azad Elî destnîşan kir ku bi çandina dar û kulîlikan civak tê xemlandin û wiha got: "Em hemû cureyên darên ku li derve û hundir tên çandin dihewînin, herwiha hemû cureyên kulîlikan û darên fêkiyan dihewînin. Em di rojê de nêzî 100 şitlî diçînin, niha di meştelê de nêzî 3 hezar cureyê daran, fêkî û kulîlkan hene, em hin ji şitlên xwe ji Tertos, Hema û hin deverên din ên



Sûriyê tînin. Bajarê Qamişlo di demê berê de bi daran nedihat xemlandin, lê niha bi hemû cureyên daran û kulîlikan tê xemlandin. Şaredarî û rêxistinên navdewletî weke erkeke mirovî daran dibin û diçînin, bi vê yekê dema ku dar û gul tê çandin rewşa avhewayê jî baş dibe."

### 'Em zehmetiyan di anîna dar û kulîlikan de dibînin'

Elî diyar kir ku karê şitilgehiyê zehmete lê xweşe û wiha domand: "Em zehmetiyê di karê xwe de dibînin ji ber ku gelek cureyên dar û kulîlikan em ji herêmên dûr tînin weke Tertos, Hema û hin deverên din ê Sûriyê. Pirsgirêk û zehmetî bi me re derbas dibin lê em wan çareser dikin, karê me yê zêde li ber tava rojê ye, zehmetiya wê heye lê karê wê gelekî xweş e."

### 'Bi çandina dar û gulan em rewşa avhewayê xweştir dikin'

Azad Elî di dawîya axaftina xwe de wiha got: "Di demê dawî de gelek kes tên şitilan dibin û bi hejmareke mezin tên çandin, ne weke sala bûrî ye, ev sal çandina daran pîş ketiye, welatî dar û gulan li pexçe, navberrê û zeviyan diçînin. Herwiha gelek malbet tên gulan û darên fêkî dibin li malên xwe û derdora wê diçînin. Bi çandina daran em rewşa hewayê û jîngehê jî dugherînin."



# Derwêşên Serdemê: Alî Haydar Kaytan û Riza Altun

**Kongreya PKK'ê ya 12'emîn ku bi banga Rêber Apo kom bû, tê de şehadeta kadroyên pêşeng Alî Haydar Kaytan ku di 3'yê Tîrmeha 2018'an de û Riza Altun ku di 25'ê Îlona 2019'an de şehîd bûne, hat ragihandin.**

**Argêş Vîyan/Qamişlo**


Yek ji kadroyên pêşeng û damezirînerê PKK'ê Fûat-Alî Haydar Kaytan sembola 'Dilsoziya Rêbertî, Heqîqet û Jiyana Pîroz e; yek ji rêhevalên destpêkê yên Rêber Apo Riza Altûn jî weke sembola 'Rêhevaltiya Azadiyê' hat destnîşankirin.

### Kurtejiyana Fuad- Alî Haydar Kaytan

Alî Haydar Kaytan sala 1951'ê şeva sersalê li gundê Xozu yê Dersimê ji dayik bû. Malbata wî ji gundê Hengirvanê bû. Malbata wî ku piştî Qirkirina Dersimê kete ber îskana mecbûrî, piştre li gundê Hengirvanê vegeriya. Ji eşîra Haydaran e. Wê eşîrê di dema komkujiya Dersimê de teslîmiyet red kir, rahişt çekê, li ber xwe da û hat mişextkirin. Demeke zarokatiyê ya bi xizmanî û zehmetiyan derbas bû.
Piştre di sala 1971'ê de li Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqereyê şoreşger nas kirin.

### Alî Haydar Kaytan serdemê weke qonaxa beriya şoreşgeriyê pênase dike:

"Li Tirkiyeya salên 1970'î tevgera ciwanên şoreşger çalak bû û em jî jê bi bandor dibûn. Bi taybetî navê Denîz Gezmîş û Mahîr Çayan sembol bû. Wê demê min hîn Rêbertî nas nekiribû, lê dibihîst ku qala wî tê kirin. Yek ji xwendekarên herî serketî yê dibistanê bû. Pişt3ı çalakiyeke şermezarkirinê hatibû girtin û 7 mehan li Girtîgeha Leşkerî ya Mamakê mabû. Piştî ku ji girtîgehê derket, me hev nas kir. Rêbertî got, dixwaze bi min re biaxive. Axaftineke ji 2-3 saetan bû, kir ku rastiya Kurd û Kurdistanê bibînim."
Ew siyasetmedar bû, gerîlla bû, rewşenbîr bû, helbestvan bû. Lê her tim têkoşerê heqîqetê bû. Wextê ku dinya bêhna xwe vedide tijî şop e. Dem jî bêdeng tê jiyîn. Lêgerîna wateyê bi tevahî tê jiyîn. Yên ku dema xwe bi wate tije dikin. Yên ku dema xwe bi wate tije dikin. Ew çîrokan ji paşgirên xwe re derbas dike. Yên ku jiyana xwe li pey heqîqetê derbas kirin. Ew derwêşên ku bang li demê dikin. Çi ji wan maye. Dîroka Kurdan a nîvsedsala dawî, berhevoka çîrokên ku di dem, ax, wijdan û mêjî de hatine xêzkirin e. Tejî pîrozî, qehremanî û fedekarî. Di van axan de bi hezaran çîrok hene. Damezrîner, rêber, hilgirê jiyaneke fedakar. Derwêşê hezar salî li pey heqîqetê ye. Şervanekê kevnar yê



ku ji bo pîrozîyên xwe xemilandî bû. Gerîlayekî ku ji bo jiyana azad çûye çiya û şoreşgerekî dilsoz ku mifta çiya ya windabûyî ji nû ve keşif kir û xiste destê gelê xwe de.

### Civîna Bendava Çubuqê

Ev bûyer gavên destpêkê yên Alî Haydar Kaytan ên rêwîstiya heqîqetê bû. Piştre jî Kemal Pîr û Hakî Karer nas kir.
"Dawiya Adara 1973'an yan jî destpêka Nîsanê bû. Li nêzî bendava Çûbûkê em bi çend hevalan re li hev kom bûn. Rêbertî fikrê xwe bi me re parve kir. Em hemû tevlî fikrê wî bûn. Bi rengekî eşkere ji em re got, em ê weke komeke îdeolojîk tevbigerin û berpirsyarî da me hemûyan. Li gorî vê yekê her yek ji me berpirsyar bû ku kesên nû tevlî komê bikin."
Piştî vê civînê hejmara endamên koma Apoyî her roj hîn zêde bû. Di Nîsana 1977'an de kar derbasî Kurdistanê bû. Alî Haydar Kaytan li Dersim, Çewlik, Dep û Xarpêtê kar kir. Hin caran diçû Dîlokê û tevlî karê Hakî Karer bû. Hakî Karer piştî ku di 18'ê Gulana 1977'an de şehîd bû, koma Apoyî derbasî qonaxa biryardanê bû.
"Şehadeta heval Hakî bandoreke kûr li me hemûyan kir. Rêbertî notek ji min re şand. Xwest ez ji bo bîranîna wî nivîsekê binivîsim. Nivîsa kum in amade kirî, li tevahiya Kurdistanê hate belavkirin. Rêbert Apo bi biryar bû ku şehadeta Hakî bê bersiv nemine. Lê bele têkildarî rêbazê ji me cuda difikirî. Ji bo bersiva ji şehadete re, ji me hemûyan zêdetir di nava lêhêrbûn û lêgerînê de bû. Biryara partîbûnê di encama vê lêgerînê de derket holê."

### Yek jî damezînerê PKK'ê bû

Di amadekariyên pratîkkirina biryara partîbûnê de Alî Haydar Kaytan jî hebû. Koma bi pêşengiya Rêber Apo ku ji Kemal Pîr, Mazlûm Dogan, Mehmet Hayrî Dûrmûş û Alî Haydar Kaytan pêk dihat, bernameya partiyê amade kir. Civîna destpêkê ya komîteyê li Xarpêtê pêk hat. Di vê civînê de Alî Haydar Kaytan ji bo komîteya leşkerî hate hilbijartin. Di 27'ê Mijdara 1978'an de kongreya damezrandinê ya PKK'ê pêk hat. Alî Haydar Kaytan tevlî koma damezrîner a PKK'ê bû ku mohra xwe li nîv sedsala dawî xist. Bûyerên ku heta vê demê qewimîn û yên di nava 45 salên piştî wê de biqewiyan, meşeke azadiya civakê bû ku bênavber dewam kir. Alî Haydar Kaytan li refên herî pêş ê vê meşê bû. Bi kelecaneke bê dawî, bi coş û dilsoziyê timî meşiya. Temenekî ji lêgerîna watedarkirina her kêliyê, Pêşengek bû ku xwe bi dilsoziyê xemilandibû. Siyasetmedarek, gerîlayek, rewşenbîrek, helbestvanek bû. Lê timî şervanekî heqîqetê bû...

### Kurtejiyana Riza Altun

Yek ji kadroyên pêşeng ên PKK'ê Riza Altun di sala 1954'an de li gundê Kuçuksobeçîmen ê Kayserî-Sarizê ji dayik bû. Ev gundê ku ji 60 malan pêk tê, ji aliyê Kurdên Elewî û Zaza ên ku ji Dêrsimê koçber bûne, ji ber zagona Fîrka-î Islahiyeyê (ji bo vegerandina herêmên bê kontrol) ku di sedsala 19'emîn de ji aliyê Osmaniyan ve hatibû danîn, hatibû avakirin, cihekî girtî bû ku bi Tirkên Avşarî re di nava nakokiya axê de bû. Altun 6 salên zarokatiya xwe li gund derbas kiriye, ji ber vê yekê ji bilî zazakî tu zarave û zimanên din ne dizanî. Dema bavê wî ji ber zehmetiyên aborî koçî Enqereyê kir, malbat di sala 1960'an de li çûn Tuzluçayirê. Heval Kemal Pîr bi wê komê re têkiliyên xurt danî. Bi wê komê re li Mamak, Abîdînpaşa û Tuzluçayirê li dijî faşîstan têkoşîneke xurt hate pêşxistin. Ew tax ji hemû faşîstan paqij kirin. Piraniya kesên li van taxan dijîn Kurdên Elewî bûn. Yên hatin sirgûnkirin, koçberkirin, feqîr bûn ku li herêma xwe nikarîbûn bijîn. Hemûyan li wan taxan şengalek ava kirin û ji bo debara jiyana xwe kar dîtin. Malbata Heval Riza Altun jî yek ji wan malbatên ku li Tuzluçayirê diman bû. Malbateke feqîr bû. Ji ber ku malbatên li wan taxan dijîn ji ber zilma dewletê hatibûn wir. Feqîr bûn. Ji ber vê yekê heval Riza û yên li dora wî kom bûbûn jî li dijî dewleta dagirker, qirker bertek nîşan didin. Kîn û hêrsa wan hebû. Ji ber vê yekê hêrs û bertekên xwe bi lehengî li dijî faşîstên wan taxan nîşan dan. Wê komê heval Riza ji xwe re pêşeng qebûl kir, ango taybetmendiyên wî ji xwe re bingeh girt. Li dora Heval Riza kom bûbûn, komeke çekdar bûn. Bi lehengî şer dikirin.
Gav avêtine riya heqîqetê

Altun piştî qedandina dibistana seretayî nikarîbû perwerdeya xwe bidomîne, ji ber vê yekê di temenê biçûk de dest bi xebatê kir. Karên rojane, înşaet, firotina li kolanan… Ji bo wî, jiyan rojên dirêj û tijî xwêhdan bûn. Lê, salên 1970'an Tuzluçayir veguherand navendeke şoreşê. Heta di bin siya zordar a darbeya 12'ê Adara 1971'an de jî, bayên çepgir li taxê derbaz dibûn. Wêrekiya Mahîr Çayan û rihê serhildêr ê Denîz Gezmîş li ser lêvên ciwanan bûn. Tuzluçayir ne tenê ji bo Altun, ji bo nifşekî bû ocaxek ku hişmendiya şoreşgerî pêxist.
Di sala 1973'an de, di 17 saliya xwe de, Altun wekî sempatîzanekî THKO (Artêşa Rizgariya Gelê Tirkiyê) tevlî komeleyên çepgir ên li Tuzluçayir û Maltepeyê bû. Ev komele ji bo wî weke dibistanek bûn. Li vir ramanên wekhevî, azadî û têkoşînê nas kir. Bi xwe van rojan wiha tîne ziman: "Ez carek din ji komeleyê derneketim." Kolanên Tuzluçayirê êdî ne tenê taxek bûn, arenayek ku tê de lêdana şoreşê lê dida bûn.

### 13 sal di nav zext û êrîşande berxwe da lê gav paş ne avêt

Di sala 1978'an de li Hîlwanê hate girtin. Salekê di bin êşkenceyên giran de hate lêpirsîn kirin. Darbeya leşkerî ya 1980'an êşa Altun girantir kir. Ew li Zindana Amed bû hedefa êşkenceya sîstematîk. Ew pênc salan di hucreyên tarî yên Amed de ma. Her çiqas dema wan li vir di bin êşkenceyên nemirovane de derbas bû jî, Altun bi berxwedana xwe bû yek ji navên ku bal kişand ser xwe. Paşê bi tevahî 13 sal li girtîgehên Edene, Mersîn, Sînop, Eskîşehîr û Antepê ma.
Polîtîkayên zindanan ên faşîzmê nekarîn biryardarî, bawerî, dilsozî û evîna Altun ji bo gel bişkînin. Ew beşdarî greva birçîbûnê ya 1981 û rojiya mirinê ya 1982'an bû. Ew di her ode û her şaneyê de bû sembola berxwedanê. Dema ku ew di sala 1991'an de serbest hat berdan, laşê wî westiyayî bû lê giyanê wî xurt bû. Ji bo wî, zindan ne tenê cihên dîlgirtinê bûn, di heman demê de cihên ku biryardariya wî ya şerkirinê tûj dikirin jî bûn.

### Li çiyayan dîsa vegera li gel Rêber Apo

Altun yekser piştî serbest berdanê çû herêma ku Rêber Apo lê dima. Di dema mayîna xwe ya li vir de, ew bi veguherîna ku PKK di 13 salan de derbas kiriye re rû bi rû ma. Apoîzm êdî ne tenê komeke çekdaran bû. Ew bûye tevgereke berfireh û girseyî ya gel. Altun di bin rêveberiya Rêber Apo de beşdarî xebatên dîplomatîk bû. Ew beşdarî daxuyaniya çapemeniyê ya dîrokî ya sala 1993'an ya dema ku PKK'ê agirbest îlan kirî bû. Di sala 1994'an de, ew bû nûnerê PKK'ê yê li Îranê û di heman demê de wekî gerîlayekî ARGK (Hêzên Parastina Gel) li çiyayan şer kir.

### Peyama Rêber Apo ya ji bona şahadeta her du şoreşgerên mezin Riza Altun û Alî Haydar Kaytan

Rêhevalên hêja: Min bi xemginiyeke mezin bihîst ku Alî Haydar Kaytan û Riza Altûn şehîd bûne. Ez ê piştre der barê bîranîna herdu rêhevalan nirxandineke berfireh bikim, ez niha bi rêzgirtineke mezin wan bi bîr tînim.
Di têkoşîna hebûna neteweyî û komunalîteya demokratîk de cihê wan her tim heye.
Ji bo paradîgma û sazûmaniya serdema nû weke nirxên bingehîn ên îlhamê ew ê heta bi hetayê rolên xwe bilîzin. Di têkoşîna me de wê weke Rêberên mayînde hebûna xwe bidomînin. Bi vê wesîleyê ez biryarên di kongreya 12'emîn a dîrokî de hatine dayîn û peyamên têkildarî demên pêş bi rêzdarî silav dikim.

### Nirxandinên rêhevalên wan di derheqê şoreşgerên mezin Alî Haydar Kaytan û Riza Altun de

Murat Karayilan: Heval Fûat ronahiyekê birdozî bû
Elîf Ronahî: Heval Fûat PKK di çarçoveya jinê de nirxand û jin timî weke pêşeng dît
Sozdar Avesta: Îro PKK hevrê Fûat e, hevrê Fûat PKK ye
Sabrî Ok: Heval Fuat Apoyiyekî sade bû.
Cemîl Bayik: Ez ê timî heval Riza ji xwe re bikim bingeh

# ‘Eger dewleta Tirk gavan neavêje, pêvajo bi ser nakeve’

**Parêzer Mihemed Emîn Meimo diyar kir ku nameya Rêber Apo ya 18’ê Gulanê xwedî giraniyeke mezin bû û got, “Eger dewleta Tirk gavên cidî neavêje wê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi ser nekeve, ev yek jî wê bihêle ku PKK’ê dîsa vegere têkoşîna çekdarî."**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ya ku Rêber Apo dabû destpêkirin, hîna domdar e, aliyên siyasî û tevgerên Kurdî li sernaserî Kurdistanê ji bo wê bi pêşengtiya Rêber Apo kar dikin. Di vê çarçoveyê de, PKK’ê gaveke cidî li ser daxwaza Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan avêt û kongreya xwe ya 12.emîn li dar xist, piştî wê Heyeta DEM- Partiyê di 18’ê Gulanê de nameyek ji bo domandina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk da. Dewleta Tirk ruxmî van gavavêtinên ku Rêber Apo, PKK û hemû tevgerên siyasî ji bo pêvajoyê tevdigerin, hîna gaveke cidî neavêtiye. Derbarê heman mijaran Parêzer Mihemed Emîn Meimo ji rojnameya me re axivî.

**‘Eger dewleta Tirk gavan neavêje, pêvajo bi ser nakeve’**

Mihemd Emîn Meimo destnîşan kir ku eger dewleta Tirk gavên cidî neavêje wê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi ser nekeve û wiha got: “Em dizanin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan banga Pêvajoya Aştî û Civaka Demokartîk da destpêkirin, tevahiya civakê roja 27’ê Sibatê nameyek ji Rêber Apo girt. Banga Rêber Apo ya aştî û civaka demukratîk ji bo gelê Kurd û Tirk di vê qonaxa heyî de gaveke dîrokî bû. Ev gav piştî têkoşîna 52 salan hat encamdan, têkoşîneke tijî ked û westandin bû. Rêber Apo banga aştiyê kir, lê hin merc hebûn, divê hikumeta Tirkiyê mercan bi cih bîne, ji ber ku pêkanîna mercên heyî bingeha pêşveçûna pêvajoyê ye. Kongreya PKK’ê li ser daxwaza Rêber Apo hat lidarxistin, lê piraniya aliyan bal kişandin ser danîna çekan, bi vî rengî dixwazin PKK’ê çekan deyne û bibe armanceke hêsan ji dewleta Tirk re. Lê ev yek nabe, di kongreyê de jî, hin mercên bingehîn ji bo meşandina aştiyê û danîna çekan hatine xuyakirin. Di serî de bi navbênkariya civaka navnetewî pêvajoya danîna çekan were pêkanîn. Herwiha mafê Kurdan di nava destûra Tirkiyê de bê bicihkirin, di heman demê de divê dewleta Tirk şerê çekdarî rawestîne.”

**‘Nameya Rêber Apo ya 18’ê Gulanê, xwedî giranbûneke mezin bû’**

Meimo diyar kir ku nameya Rêber Apo ya 18’ê Gulanê xwedî giraniyeke mezin bû û wiha domand: “Em dizanin ev zêdeyî 10 rojane ku Kongreya 12’an a PKK’ê li dar ketiye, lê hîna gaveke berbiçav ji hêla dewleta Tirk ve nehatiye avêtin û êrişên Tirkiyê berdewam in. Tevgera Azadiyê ne ji lawazbûnekê şer rawestandiye, lê belê li ser doza Rêber Apo gav avêt, PKK’ê ne lawaz e, armanc aştî û demokrasî ye, eger dewleta Tirk gavên cidî neavêje, pêvajo bi ser nakeve û wê PKK’ê dîsa dest bi şerê çekdarî bike û bi hêzeke mezintir têbikoşe. Nameya Rêber Apo ya 18’ê Gulanê, xwedî giranbûneke mezin bû ji bo gelê Kurd û Tirk, herwiha axftinên nirxdar kirin. Tê de hat egeriya rawestandina şer hat dîtin, bi mercê ku mafê Kurdan mîna yê gelê din di destûrê Tirkiyê de bê parastin û hemû gel bi hev re jiyan bikin. Rêber Apo rêberekî dîrokî ye, ji ber ku wî gelek zehmetî û êş bi dirêjahiya 52 salan dît, tevî wiha jî bû avakarê aştî û demokrasiyê, keda xwe xist xizmeta gelê Kurd û gelê Tirkiyê.”

**‘Dayîna mafê Kurdan, cidiyeta Tirkiyê ji bo pêvajoyê diteyîsîne’**

Parêzer Mihemed Emîn Meimo tekez kir ku eger dewleta Tirk mafê gelê Kurd bide, wê cidiyeta wê ji bo Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bide xuyakirin û wiha axivî: “Di Kongreya 12’an de, PKK’ê diyar kir ku ew ê bikevin qonaxeke nû ya têkoşînê, tiştekî tekez e ku li ser vê bingehê jî wê pêvajoyke nû dest pê bike. Pêkanîna banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk wê gelek guhertinan li hundirê Tirkiyê



û Bakurê Kurdistanê pêk bîne. Nêzî 80 melyon kes li dewleta Tirkiyê dijî, piraniya gelan hikumeta Tirkiyê û siyaseta wê napejirînin, ji ber ku paşguhkirinek ji wan gelan re heye, ev yek jî dihêle qelsbûnek û gelek astengî ji bo dewletê çêbibe. Niha em bendewar in ku dewleta Tirk mafê Kurdan di destûra nû de bi cih bike, weke mafnas jî em tekez dikin ku bicihkirina mafê gelê Kurd esasê her tiştî ye, pêkanîna vê yekê cidiyeta dewleta Tirk ji bo meşandina pêvajoya aştiyê dide xuyakirin. Eger ev merc pêk were wê mafê gelê Kurd mîna mafê Tirkan di destûra nû de bi hevbeşî bijîn, hem jî rewşa Tirkiyê bikeve qonaxeke nû, wê gelê Kurd ji wiha bêtir tevlî xebata siyasî, civakî, çandî û hwd… bibin, bi vî hawî wê gelê Kurd di Tirkiya nû de bibin xwedî rol.”

# Nedîm Seven: Demeke nû ya têkoşînê destpê dike

**Delegeyê Kongreya 12’emîn a PKK’ê Nedîm Seven diyar kir ku divê êdî tevlîbûneke rast li Rêber Apo bê kirin û got, bi kongreyê re pêvajoyeke nû ya têkoşînê destpê kiriye.**

Nedîm Seven anî ziman ku di çarçoveya perspektîfên Rêber Apo de ku li Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ye, wan kongreyek pêk anîn û hemû hevalan bi îradeyeke mezin dilsoziya xwe ya bi biryarên Rêber Apo re nîşan dan, ji niha û pê ve jî weke kadroyên kevneşopiya Apoyî wê bi biryar bin ku di vê xetê de bimeşin.

Nedîm Seven di şexsê kadroyên pêşeng Alî Haydar Kaytan û Riza Altûn de şehîdên têkoşîna azadiyê hemû bi bîr anî û anî ziman ku ew derbasî nava pêvajoyeke dîrokî



bûne.

Ji delegeyên Kongreya Awarte ya 12’emîn a PKK’ê Nedîm Seven diyar kir ku kongre asteke dîrokî ye û got, “Ev yek tenê dawiyek nîne, di heman demê de ew ast e ku danheviyên şoreşgerî derbasî qonaxeke nû ya civakî û siyasî tê kirin.”

Seven destnîşan kir ku di dîroka têkoşînê ya 42 salan de PKK ne tenê weke rêxistinekê, di heman demê de weke amûreke veguherîna civakî bê nirxandin û got, “Eger PKK tenê weke partiyekê bê nirxandin wê kêm be. Nirxên şoreşgerî yên hatin afirandin, dînamîkên azadiyê û têkoşîna bi pêşengiya jinê danheviyeke welê afirandin ku dikarin rê nîşanî sedan salan bide.”

Seven bi taybetî bal kişand ser tevgera azadiyê ya jinê û got, “PKK’ê xeteke welê destnîşan kir ku bi pêşengiya jinên Kurd li dijî her cûre koletiyê têdikoşe. Ev yek ne tenê li Kurdistanê, bandor li tevahiya cîhanê kir.”

Têkildarî nîqaşên li ser têkoşîna çekdarî jî Seven anî ziman ku ev rêbaz di cewhera paradîgmaya Apoyî de nîne, lê belê di şert û mercên demê de neçarî bû û got, “Li hemberî me avaniyeke netewe dewletê, faşîst û moderrnîteya kapîtalîst hebû. Berxwedana çeekdarî di nava wan şert û mercan de mecbûrî bû. Lê belê em niha derbasî nava demeke nû dibin.”

Seven diyar kir ku di kongreyê de rexnekirin û rexnedayin bi berfirehî hatin nîqaşkirin û got, “Pirsên li ser, ‘Ev veguherîn çima bi derengî hate kirin, çima guherîn bi zehmetî pêk hat’ bi rengekî ji dil hatin nirxandin. Rabirdû hate nirxandin û berpirsyariyên ji bo dema nû hate diyarkirin.”

Seven destnîşan kir ku wezîfeya ji niha û pê ve ya wan kadroyan e ku mîrateya şoreşgerî ya PKK’ê bi perspektîfa sosyalîst û demokratîk a nû ragihîne. **ANF**



## Desthilata HTŞ’ê zemîna vegera DAIŞ’ê bi hêztir kiriye

**Dilyar Cizîrî**

Bi destpêka êrişa çekdarên HTŞ’ê li Helebê û şerê wê li dijî hêzên Artêşa rêjîma Esed û heta niha piştî hilweşîna rêjîma berê ya Sûriyê gelek dîmenên ku çeteyên DAIŞ’ê beşekî êrişê ye diyar bû. Bi Ketina rêjîma Esed re, ev hîn zêdetir diyar bû, ji Perava Sûriyê biger, heta Heleb û Şamê alên DAIŞ’ê li gelek cihan hate dîtin. Ev dîmen heta niha jî gelek caran têne parvekirin.

Li gelek cihan jî di şahiyên lidar dixistin jî aşkere ala DAIŞ’ê beriz dikirin. Dibe ew dîmen ne bi ferman û gotina rayedarên HTŞ’ê bê yî erêkirina wan dihate bikar anîn. Heger bi ya wan be, ev metirsiyeke mezin a li ser tevahî gelê Sûriyê ye, heger ne bi erêkirina fermandaran be, ev jî asta belavbûna çeteyên DAIŞ’ê û xwe bicihkirina di nava hikûmeta nû de diyar dike. Ev jî tê wateya hikûmeta nû lawaze û nikare di hindir de guhertinekê pêk bîne. Ji Sûriyê û bi taybet di rewşa heyî de hikmetek ku rayedarên wê bê hêz bibin, wê civaka wê berdêlên mezin bide. Tişta li Sûriyayê niha dibe jî ew e.

Li Perava Sûriyê bi dehezaran kes hatin kuştin, li deverên Durziyan wekî Siwêda, Ceremana û deverên din jî komkujiyên pêk hatin, isbat dike, destê DAIŞ’ê di Sûriyê de gelekî bi hêz bûye.

Di heman denê de piştî hilweşîna rêjîma berê ya Sûriyayê êrişên şaneyên DAIŞ’ê li Sûriyayê zêde bûne, bi taybet li herêmnê di bin sîwana Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê. Ev bi xwe jî nimûne û isbateke din ku hikûmeta HTŞ’ê di hindir de wê nikaribe li dijî DAIŞ’ê şer bike. Ev rastî li ber çavan e û êdî tu kes nikare ji vê rastiyê bireve. Lê carde jî Amerîka û welatên Ewropa dixwazin hikûmeta HTŞ’ê cihê xwe di şerê li dijî DAIŞ’ê de bigre.

Tevî ew asta têkiliya berê ya bîrdozî di navbera DAIŞ’ê û HTŞ’ê de dizanin, dibêjin ew ê derfetên bidin hikûmeta nû ya Sûriyayê ku şerê xwe di cihê DAIŞ’ê de bigre. Hikûmeta HTŞ’ê jî hin dîmen û qaşo belgeyan belav dikin ku hêzên wan li dijî DAIŞ’ê êriş li hin cihan pêk tîne. Ev ne mumkine pêk were û Ebû Mihemed El-Colanî şerê DAIŞ’ê bike. Ew dîmen û nûçeyên têne belavkirin ku ew li dijî DAIŞ’ê çakaliyên pêk tînin.

Tu kes ji îdayên desthilata HTŞ’ê bawer nake ku ew şerê li dijî DAIŞ’ê dimeşîne. Hêza wan jî têrê nake ku raya giştî bi riya ragihandina xwe bixapînin. Lê diyare hêzên navdewletî dixwazin guhertinekê li Sûriyayê pêk bînin. Ji ber wê ihtîmalek mezin ev sedema sereke ya ewqas pêşketina tevgera DAIŞ’ê ya di herêmê de ye. Wer xuya dike di demên pêş de wê pêwistiya herêmê bi tekoşîneke mezin a li dijî DAIŞ’ê heye.

Dibe kowalîsyona li dijî DAIŞ’ê xebatên xwe ya di Sûriyayê de bixe qonaxeke din a tekoşînê. Wê demê hikûmeta HTŞ’ê mecbûre nerînên xwe bidin guhertin. Heger nikaribe wan guhertinan pêk bîne. Wê demê dawiya wê nêzîktir dibe.



# Îbrahîm Şêxo: Li Efrînê binpêkirin, metirsî û kiryarên dagirkeriyê didomin

**Bi rêkeftin û guhartinên ku di asta Sûriyê de pêk hatine, gelê Kurd di Efrînê de hê jî di atmosfera tirs û gefan de jiyan dike. Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo tekez kir ku li Efrînê komên çeteyan binpêkirin û kiryarên dijmirovî berdewam dikin.**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Rewşa Efrîna dagirkirî ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan ve, ji 7 salan û heyanî niha tu guhartinên erênî çênebûne û komên çeteyan bi heman zihniyet û hovîtiyê kiryarên xwe li ser gel dimeşînin. Bi guhartinên ku di Sûriyê de hatine dîtin û nêzîkatiyên di navber QSD û Hikumeta Şamê de hatine dîtin re, atmosferek ji aramî û vegera gelê Efrînê ya bi darê zorê ji 7 salan ve koçber bûye hate teysandin. Ji lewra beriya derketina biryareke fermî ku heyanî niha jî li ser vegera bi ewle di navbera her du aliyan de nehatiye lihevkirin, beşek ji gelê Efrînê serbixwe piştî 7 salan vegeriyan cih û warên xwe.

Lê belê; komên çeteyan weke her car ev yek bikar anîn û dest davêjin kesên ku vegeriyane ger demkî be yan demdirêj be. Di van demên dawiyê de gelek kes hatin girtin û revandin ku ji wan bace tê xwestin, her wiha piraniya malbatên ku vegeriyane nikarîne mal, zevî û zeytûnên xwe bidest bixin, da ku bidestbixin jî ji wan baceyek mezin bi dolar tê xwestin. Ev yek jî ji aliyê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye ve rojane tê belgekirin.

Herî dawî komên çeteyan bi hinceta danûstandin û karkirina bi Rêveberiya Xweser re gelek kes û bi taybet ciwanên Efrînê hatine girtin. Li gorî belgeyên ku ji aliyê Rêxistina



Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye ve hatine kirin. Ciwanê bi navê Reşîd Kêlo (35), Janyar Kêlo (25) û dayîka wan Zekiye Kêlo ku li Til Rifetê bi hinceta danûstandina bi Rêveberiya Xweser re hatine girtin. Her wiha Ciwanê bi navê Mihemed Osman (35) ji Gundê Erendê ye li navenda bajêr bi heman tewanê hatiye girtin.

Hêjayî bîrxistinê ye ku ev serdegirtinên ku tên kirin ji aliyê hêzên bi navê hevpar yên (Emşat û Hemzat) ve tên kirin.

Girêdayî rewşa dawiyê ya herêma Efrînê û kiryarên çeteyên ku di derheqê gelê resen de tên kirin Berdevkê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye Îbrahîm Şêxo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Derketina xelkên biyanî ji Efrînê, metirsiya guhartina demografîk qels kir’**

Îbrahîm di destpêkê de da zanîn ku derketina xelkên biyanî yên Ereb ji Efrînê metirsiya guhartina demografîk kêm kir û wiha got: “Piştî hatina desthilata nû ya Sûriyê, me dît ku gelek guhartin hatin çêkirin. Bi taybet di aliyê vegera gelên ku bi sala ye ji bajar û warên xwe koçber bûne; karîn di vê demê de vegerin malên xwe. Bi tayebt ji bo Efrînê hejmarek mezin ji xelkên ku piraniya wan ereb bûn, vegeriyan bajar û herêmên xwe. Em dizanin ku Efrîn ji dema dagirkirinê de rû bi rûyê guhartina demografîk re dima ku hejamara nifûsa gelê Kurd pir kêm ma bû. Vegera welatiyên Efrînê ji bona cih û warê xwe û bi hejmareke mezin gavekî erênî ye, lê pêwîste ku gelê Efrînê bi rengekê ewle vegere cih û ware xwe û xwe biparêze û bi rêxistin bike.

**‘Binpêkirin, kiryar, metirsî û sûcên dijmirovê berdewam in’**

Şêxo di berdewamiya axaftina xwe de tekez kir ku kiryarên çeteyan bi taybet yên aborî li ser gelê vegeriya ye tê meşandin û got: “Binpêkirin di hundir Efrînê de nehatine rawestandin, bi taybet piştî vegera hin malbatên koçber ku dixwazin êdî li warê xwe jiyan bikin. Ev yek bi taybet di aliyê xwestina bace, zeyt û zeytûnan de tê kirin. Ev kiryar ji aliyê Ofîsa aborî ya firqeya Hemzata ve tê kirin her dem dengên xwe li ser giropêm Whatsappê rêdikin û dibêjin “Bila gelê resen bacê bide, ger nedin emê bi darê zorê ji wan bistînin an jî berhem û zeviyên wan bidin kesên din” da ku mal û milkên gel ji destê wan neçin, neçar dimînin ku pereyên pir bidin û xwe ji gefên wan biparêzin. Her wiha li piraniya gundan jî malên gel radestî wan nehatine kirin”.

**Bace feriz kirin û girtina gel**

Îbrahîm di axaftina xwe de ev bûyer anî ziman: “Hemwelatiyek ji Gundê Ûmer Simo beriya demekê ku piştî 7 salan vegeriyabû gundê xwe, komên çeteyan gotibûn bila baceyê bide, lê derfetên wî nîn bû ku niha bide, gotiye ezê piştî mewsima zeytûnan bidim. Lê di dema komkirina pelên rezan de ew ji aliyê giropên çeteyan ve hate îşkencekirin û lêdan, da ku pereyan bide. Hin kesên din jî hene ku rewşa wan ne zelal e. Hejmarek mezin ji gelê Efrînê di zîndanan de ye û tu biryar derheqê wan de nehatiye standin. Qaşo wê bi berdêla di navbera HSD’ê û Ewlekariya Giştî de bên berdan, lê heya niha jî tu çareserî nehatiye danîn”.

Îbrahîm Şêxo di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku pirsgirêk, tevlîhevî û kiryar hê jî nehatine sekinandin û ew bi hêvî ne ku ev rewş bi riya diyalogê di navber her du aliyan de bê çareserkirin, da ku gel bi vegerke bi ewle û rûmet here ser cih û warê xwe.

## Erdogan li hemberî Kurdan, HTŞ’ê û DAIŞ’ê hildibijêre...



**Zekî Bedran**

Tirkiyê, ji bona Rojava, Rêveberiya Xweser û pêkhateya demokratik têkbibe bênavber hewildan kir û heya niha jî didomîn e. Bi kurtasî polîtîkayên xwe xwestin Rojava bi giştî têk bibin. Yanî dixwestin Rojavayê Kurdistanê, beşa herî biçûk ya Kurdistanê ye ji Kurdan paqij bikin. Ew ê Kurdên ku li ser sînorên Tirkiyê bi cih bûne derbixin û li şûna wan du milyon Erebên ku koçberî Tirkiyê bûne bi cih bikin. Nexwestin kurdan jî wek cîranê xwe bibînin. Erdogan di Desteya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî de bi nexşeya Sûriyê di destê xwe de ev plan ji tevahî cîhanê re ragihand. Qada ku Kurd lê dijîn ji Efrînê heta Dêrikê weke herêmeke ewlekariya kûr ya 30 km nîşan dan. Dê 2 mîlyon mirov ji derve bînin û wan bi cih bikin, mîna ku ev herêm vala bûn û kes li wan nejiya bû bidin xuyakirin. Ger hûn 2 mîlyon Ereban bînin û li wir bi cih bikin, ji kembera Ereban a ku hişmendiya rêxistina nijadperest ya Baasê xistibû meriyetê wê hişmendiyekê hîn xerabtir derbikeve holê. Dema ku Baasê Ereb anîn û gelê Kurd kêm kirin, Kurd ji herêmê dernexistin. Lê Tirkiye li herêmên ku dagir kiribûn mazûvaniya Kurdan nekir. Wekî ku Efrînê paqijiya etnîkî pêk anî. Ger ev plan bihata cîbicîkirin, wê qirkirinekê giştî pêk bihata.

QSD’ê bi hêzên hevpeymana navdewletî re li dijî DAIŞ’ê şer kir. Zêdetirî 20 hezar şehîd û birîndar çêbûn. Artêşên Iraq û Sûriyê nekarîn xwe li hember DAIŞ’ê biparêzin. Hêzên DYA û Ewropayê leşkerên xwe dernexistin qadan. Hêza sereke ya şer dikir QSD û YPJ bû. Bi têkbirina DAIŞ’ê cîhan ji vê sosretê rizgar kirin. Şerê li dijî DAIŞ’ê li ber çavên cîhanê pêk hat. Beşek mezin a cîhanê bi awayekî tevlî vî şerî bû. Wan baş dizanibû ku çi diqewime. Tevî vê yekê jî Tirkiye bi eşkere yan jî bi dizî piştgirî da El Nûsra û DAIŞ’ê li dijî Kurdan û bi wan re hevpeyman çêkir. Qaşo weke ku Kurd û QSD li dijî DAIŞ’ê şer nakin dan xuyakirin. Zext li DYA û hêzên din kir. “QSD-YPG terorîst in. Bikaranîna van li dijî DAIŞ’ê şaş e.” Bê westan propaganda kir û got: “Pêşvebirina terorîstan li hember terorîstan ne siyaseteke rast e” û dev ji bazariya li gel DYA û hêzên hevpeymanê berneda. Xuya ye ku Tirkiye ya ku di warê HTŞ’ê de bazarî kiriye, gihîştiye armanca xwe. Dema ku ew ber bi Şamê ve diçû, bi çeteyên xwe re êrîşî Şehba û Til Rifatê kirin. Armanca wan ya bingehîn ew bû ku Rojava û Rêveberiya Xweser têk bibin. Li gel van êrîşan hewl dan HTŞ’ê jî bixin nava herêmên xweser. HTŞ ji xwe dema ku li Şamê bi fermandariya QSD’ê re peyman îmze kir çalak bû. Di destpêkê de, rayedar û nûnerên wan destnîşan kirin ku daxwaza Kurdan a statu û xweseriyê nayê pejirandin. HTŞ’ê ne xwediyê hişmendî û siyaseteke demokratîk bû. Nêzîkatiya wan Baas’ê tîne bîra mirov. Tevî vê yekê jî, Tirkiyê pergala dewleta netewe ya bi feraseta navendîparêz parast.

Çend roj berê Erdogan di derbarê Rojava de daxuyaniyek da û gotibû, “Pêwîste yekîtiya axa Sûriyê, artêşa welat bi awayekî navendî were birêvebirin.” Lê gelên Sûriyeyê ji ber rêveberiyeke zêde navendî zirareke mezin dîtibûn û ji ber vê yekê têk çû. Ger hûn rêveberiyeke pir navendî ava bikin, HTŞ’ê ku xwedî hişmendiyekê ji Baasê paşverûtir e, li Sûriyê serdest bike, hûn ê hêvî û bendewariyên gelan têk bibin. Sepandina rejîmeke antî-demokratîk li ser Sûriyê ji bo ku Kurd dayika xwe nebînin, tê wateya xistina hemû gelan di tariyê de. Erdogan piştî ku Trump hat ser desthilatê lez da xebatên xwe yên ji bo astengkirina QSD’ê. Trump ji bo azadiya gel ti fikar û xemê wî nîne. Nêzîkatiya wî ya li hemberî Filistîniyan diyar e. Xezze wêran bûye, gel bi mirin û birçîbûnê re têdikoşe. Çareseriya Trump ew e ku xelkê Xezeyê li welatên din belav bike û li wir weke konekê bikar bîne. Di dawiyê de Erdogan bi DYA û HTŞ’ê re peymaneke sêalî ya xebatê pêk anî. Demeke dirêj ji DYA’yê re digot, “QSD’ê bi tenê bihêle, karê ku ew dikin em berdewam bikin.” Lê DYA’ QSD’ê hilbijart ku di şer de serkeftî û cidî bû. Erdogan plansaziyên alternatîf ên wekî, “Em li Tirkiye, Iraq û Sûriyê têkoşîna li dijî DAIŞ’ê bimeşînin û girtiyên DAIŞ’ê radestî HTŞ’ê bikin.” Heta niha jî desthilatiya DYA ev yek ne dipejirand, lê Trump niha ji vê re dibêje erê.

Plansaziya bingehîn ew e ku Amerîka dev ji QSD’ê berde. QSD’ê bêbandor bikin. Divê ti peywendî û bingehên navneteweyî nemînin. Bila QSD’ê bê tecrîdkirin, herêmên xweser û destkeftiyên şer bi giştî ji holê rabin. Beriya niha bi Rûsya û Îranê re bi navê pêvajoya Astanayê hevdîtinên hevpar pêk anîn. Tişta ku Astanayê kir ew bû ku herêma xweser ne rewa ragihand û ji hemû platformên navneteweyî dûrxist. Aliyekî din ê Astanayê ew bû ku amadekirina HTŞ’ê ji bo êrîşeke li dijî Baasê bi Rûsya û Îranê sist bike bû. Niha dewleta Tirk bi Îmraliyê re hevdîtinan dike. Dibêje bila biratiya Kurd û Tirkan misoger bikin. Rêber Apo bi dawî kirina hebûna PKK’ê û têkoşîna çekdarî gaveke dîrokî avêt û berpirsyarî girt li ser milê xwe. Eger Tirkiye kurdên xwe bipejirîne û zagona biratiyê ava bike, çima plansaziyên qirkirin û komkujiyan li ser Kurdên li Sûriyê çêdike? Wisa xuya dike ku dê DYA di van mijaran de bi Tirkiyê re li hev bike. Divê gelên Sûriyê û yên daxwaza demokrasiyê dikin van geşedanan bi baldarî bişopînin. Jixwe biryara rakirina ambargoya li ser hikûmeta HTŞ’ê dabûn. Dibêjin em vê hikûmetê li ser piyan bihêlin. Tişta ku Tirkiye ewqasî di nav de ye, metirsiyê zêdetir dike. Veguheztina girtiyên DAIŞ’ê ji bo HTŞ’ê tê wateya azadkirina wan. Hişmendiya DAIŞ, El Qaîde û HTŞ’ê ji hev cuda ne. Nayê zanîn HTŞ an DAIŞ ji ku derê destpê dike û li ku derê ji hev cuda ne. Ji ber ku di navbera wan de cûdahiyeke zelal nîne.



## “Tirkiyeyeke Demokratîk”

**Farûk Sakik**

27’ê Sibatê Rêber Apo bi navê “Banga Aştî û Civaka Demokratîk” pêngaveke dîrokî dest pê kir.

Piştî vê bangê Kurdan dest bi serdemeke nû ya guherîn, veguherîn û ji nû ve avakirinê kirin.

Ev yek ji aliyê dewletê ve jî hatiye qebûlkirin. Ji aliye herdû aliyan ve gav tên avêtin. Em van gavan wek gavên ber bi aştiyê ve bi nav bikin. Peyva aştiyê peyveke pîroz e. Zehmet e. Dem dixwaze. Di derûniya aliyan de guhertinek nû çêdike. Roj-salên şer bi êşbûn e. Ji bo saxkirin û dermankirina van birînan wext-sebir û zimanek bi baldar dixwaze. Di her axaftinê de dibe ji bo ku ew birîn careke dina êş nede dil û mejiyê mirovan, hesasiyetiyek hebe. Ji peyvên ku aliyê dina dêşîne mirov dûr bisekine. Lê dewlet ji destpêkê de, tenê bi du saxkirina birînên aliyê xwe ketî ye. Hin birînên ku wan di hişmendiya civaka xwe de çêkiribûn, dixwestin sax bikin. Dermanê wan jî gotinên ‘terora Kurda’ bû. Her wek Kurdan di dîroka sed salî de zilmeke mezin li Tirkan kirine. Ew ji cih û warên wan koçber kirine, gundê wan şewitandine, li Roboskê 35 zarokê wan kuştine, 12 hezar windahiyên wan yê bê aqûbet hiştine, zimanê wan qedexekirine, di dema şer de çekên kimyasal bikaranîne û gelek tiştên dinan. Navê tedaviya xwe jî ‘Tirkiyeyek bê Teror’ binavkirine. Rast e! Wan tiştên ku me li jor rêzkir hemû kiryarên terore bûn. Kîjan hêzan ev pêkanîbû ku îro şûnde soz bide wê pêk neyne, wê Tirkiyeyeke bê teror were avakirin. Kurdan ji vana yek jî pêkneaniye. Ji bo vê yeke ev tesbît ji bo Kurdan ne rast e. Rêber Apo li ser navê Kurdan şansekê dide aştiyê û dibêje ji bo saxkirina birînan pêdivî bi ‘nexweşxaneyekê’ heye. Ev nexweşxane aşitiyê. Ev nexweşxane neyê avakirin, wê birîn neyên dermankirin û wê birînên nû peydabibin. Navê vê nexweşxanê bila ‘bi tenê saxkirina birînên berê-Terorsuz Tirkiye’ nebe. Em navê ‘aşîtî û saxkirina birînên herdemî’ lê bikin. Rêber Apo di axaftinek xwe ya bi heyeta Îmrali re bersivek weha dide pirsa, civak ji gotina ‘Tirkiyek bê teror’ acize; Hûn jî bibêjin ‘Tirkiyeyeke demokratîk’. Ha li vê derê nabêje ser raboriya salên reş biruxînin û werin em rupelek nû vekin. Na, dibê je “di vê rûpela nû de, ew birînên berê jî wê çawe werin dermankirin jî cîh bigirin.” Divê civaka Kurdan van gotinên Rêber Apo esas bigirin.

Tiştek dinan ku di civakê zêde tê meraqkirin anjî nayê qebûl kirin; teslîm kirina çekaye. Du alî şer bikin û rojek jî di aştiyê de biryar bigirin, divê şertên herdu aliyan wekhev be. Heger bi tenê şertên aliyekê were cîh, tê wateya aliyek biserketî. Aliyek bi ser keve êdî navê pêvajoyê aşitî nabe. Lê herdu aliyên ku şer kirî tu aliyek biserneket û îro aşitî pêk tê. Anjî ji bo aşitiyê pêvajoyek destpêkiriye. Şertên herdu aliyan yek e. Bi kurtasî herdu alî çek datînin û yek li ser yekî nikare bide ferzkirin. Di aştiyê de şer disekine û pêdivî bi çekan namîne. Çek li dîwara daliqandî dimîne û dûa dikin dibêjin: ”xwedê tu carek din vî çekî ji vî dîwarî neyne xwarê”

Çek-sîleh, her çiqas sar be, reş be, êş be jî, ji bo Kurdan pîroz e. Were bikaranîn jî û li dîwar daliqandîbe jî. Bila tu kes hewil nede û destdirêjiya nirxa pîroz neke. Ji xwe em bawerin, wê Rêber Apo destûr nede vê niyeta wan a xirab.